

Kiriyyari Roja Nû: ji bona erden Sûriye û Libnané, 15 lisreyen Sûri; ji bona welatén din 2 lisreyen ingilizi. Bihayê Hejmarekê; 15 Qemeri.

ROJA NÛ

XWEDÎ Ú GERİNENDE: MİR Dr. KAMIRAN ALİ BEDIR-XAN

Dîwan û gerfnendekariya
Rojnamé: Bérüt-Birc; Weqîf Tabet, Telefona Dîwa
nâ: 74-04; Telefona Mala
Xwediye Roja Nû: 84-41
Edresa telg: Bérüt-Rojanû.

KURDISTAN

YEKİTİYA KURD
ÇI YE, Ü BI ÇI PËK TË

1 — Yekîtiya Zarav ; 2 — yekîtiya Tipan ; 3 — yekîtiya Cek ; 4 — yekîtiya armanc ; 5 — yekîtiya Raman ; 6 — yekîtiya Dîni
1 : Yekîtiya Zarav

Di Kurdistanê de, heft zarav an şewe hene ; herweki : sorî, kuhorî, bextiyarî, hawirman, gewiran, zazî û kurdmancî.

Divaye ev heft şiw bigjine hev û zimaneki tevayı bête pê ; ev ji bi havila xwendevan û rojnameva nîn me ê zana pêk tê.

Divê ji van her heft zaravan, xwendevan me hebin, û her yek bi zaravê xwe şîhir an nesir bişinîn rojnameyên kurdi ; gerfnende her dem pîrsen dîva û zanaki ji nav bigre û di nav zimanîn kurdi de biçîne, pîrsen ko di kurdmancî de tune bin, ji van zaravan teva bikin bi vê pêcandinê yekîti û nézingî û piraniya zimîn pêk tê ; heke xwediyê van şewan bejîn : cîma zarawê me na keve rewacê !

Ev ji ne pirsek zanistî û welat parêzî ye ; lewre, di van her heft zaravan de kifjan zarav dewlemedî û pey ve manîn vî zehî bin, divê ewê bibe zimanê tevaya Kurd. Madam armanc û raman û bêja kurd yek e, divê kurdmancî mig-teqê kurd û Kurdistanek xweser bê.

Cewa ko mi, di şîrekî xwe de gotiye : Lorî, kuhorî, û zazî bextiyarî tev bîzan. Hawirman, kurdmancî û gewran, yekwe warê me Iran; Nav bîra zaran, ji bo me yek hevok û bêje ye,

Dîn û mezheb nayê hijmar, lêtu kurdmancî bîzan.

Herweki di welatén beyanî û pêş ve çûyi de, zaravân tîvel hene, di nav van zaravan de, yekî tokiz bijartîn, û ên mayîn, bûn per û baskê zimîn. Em ji bi wê re dikarin bigîbin qûnaxa azadiyê.

2 : Yekîtiya Tipan

Her xwende dizane ko tipen xweser ji me re tune bûne ; tenê hin qâbir û qelasikan divanên şîhir û mîna « Xanî » — rebmeta xwedê lê bit — folklor xwe, bi tipen erebi nivisandine ; ew ji bi awa û qeydeyên zér û ziberan.

Bi zor dihatin xwendin, lê disa temamî ne dihatin xwendin, weke: xwe û xû ji her du dernedikîn û weki din ji bê, bi tipen kurdi, tu kîmasî di zimanê me de nine.

Carna rojnama « Gelawêj » digilî me, bîko zarawê sorî, em temamî nîzanîn, ji ber ko tipen erebi ye, em genc ni karîn bixwinin, hévi ji xwedê, kurdîn hemî welati, dibe ko di vê babetê de inadê ne kin û hévi heye ko na kin ji. Divê heri her tişti yekîtiya kurdi, bi yekîtiya tipan ve teva bibe. Heke em bêjîn, latîn tipen beyanî ne, belê tipen erebi ji ne yê me û ne semawi ne,

Ji xwe ji hemî tipen cihanê re neqîş û elamefen muxaberê têngolin. Bi gotinekê zanistî kewî dibe ko her çar Kurdistan dest bi a.. b.. c... bikin ; cewa 4 milyon birayen me Kurdistana Bakur, bi van tipan hin bûne.

3 : Yekîtiya Cikrofi

Erdê Kurdistanê bi awayê xerîstî ji her kesî re nas e. Şabas û neyman ji Yezdanê pak re ko di kişwerê me de, tu nav birêne me bîyanî tu nin : tenê di ber baskê feleka reş de, em pengizine ; û di çar hawiran de dijin. Lî erdê me wek « pelaseki kerkit » rassistî û em her çar welfati di rex hev de dijin û haydarê roja xwe ne.

Di dema aştiyê de, divê dengê Kurd û daxwaza Kurdistanê yek be, ne kû her welitek, bi awakî ne dîti, bêne xapandin û xebata hinde salî û xwîna şehîdan li erdê xin ; û me hember neyar û li pêş alema cihanê şermende bikin û di dîroka mîletê Kurd de, me bednam bîhelin ; û 10-12 milyon kurdin ber mirad, di kurtala dijeha neyar wer kin. Hêvi dibe ji nuho de, ber hev û du, ji wê tirba reş û kür badin û bidin ser riya azadiyê. Ma ne şerm e ho em ji bo mezzâniya zefm û hin xûdpesandan bibin kerî, kerî ... Ma qend Kurdistan hene ko qend xwendekar hebin, me tevan Kurdistane û azadîrê kurd kî be, hemî kurdan ew divê.

4 : Armanca Kurd

Armanca Kurd, serxwebûn û dem û dewrana Kurdistan e. Ev daxwaz ne tekane ye. Azadî û berxwedariya teva mîletê Kurd e.

Wiha neng e xebat, canbêzari û comerdî ji namûsa hemî lawanê kurd e.

Her xort û her xwendeyê ko hewiya xebat û cameriye, ji xwe dibe, divê ew bi xwe bigere malik û li batêni riya xebatê bibûne û bi awayê xebatê bawerî bide û dest bavêye zincirâ xebata yekîtiye, madam bêja kurd yek e, nav bîren partiyan ji bo ci ?

Berberi û parf û navbîrfya hevalan, li bî kijan Mirzayê hebe, ew dijminef fikra me ye, heke bira, û bav, ap û lawen me ji bidin ser ve réça şermezár, û heke em ji terka wan nedîn, em ji kem teba ne.

Lewre ev riya dûr û dirêj, ya me daye ber xwe, qûnaxa wê dirêjahiya omrê me ye.

Heya bi rijandina xwîna me be ji, em xwe na hévişinîn. Cewa ko şehîden me ên wîlet, kevir û latêni Kurdistan, bi xwîna xwe xemîlandine û dê bixemîlinin ji ...

5 : Ramanâ Kurd :

Ramanâ kurdên her pênc hawiran yek hikûmeta teva Kurdis-

Ber Bi Serfiraziyé ve

MOSKU. — Sebastopol keliye destê qîwetên rûsi.

LONDRE — Britanya Mezin û hikümetîn kişîwerê britanî ji 1-ê çîriya berî sala 1941 i û heta 31-ê adarê sala 1944—an 5.031 tang, 6.778 belafir, û ji bona 80 milyon lireyên ingilîzi zad û zexire, mekiye û hûr û mûrén din şiyandine Sovyetistane.

LONDRE — Haziriyê eniya diwemîn bê etlahî dom dîkin, go tiye Radyoa Luksemburgê.

ENQERE — Radyoa tirkî elam dide, ko serê sibehê payetextê Romania'yê bi awaki xurt hatiye bombardiman kirin.

CEZAYIR — Bombeavêjén Hevalbendan ên giran li Winer Noys stadtê xistine, axa Ewîstirayê

LONDRE — Radyoa Londre elam dide: Eleman dixwest ji Parisê 5.000 xebaker berhev bikin û bisinîn Germanistanê; lêbelê bitenê 450 helênen wan hatine komgeha rekirinê.

BOMBARDIMANÊN GIRAN

LONDRE — Duhî 3.000 belafirê Hevalbendan dirêji hêjagehén dijininan yên erdê Frense, Belçike û Luksemburgê kirine. Di nav sê rojau de, refen bombeavêjén xurt, sê cara li Berlinê xistine. Radyoa elemani dibêje ko çekê Hevalbendan ê hewayî di ser Brandenburg-wilayeta Berlinê — û di ser erdîn Germanistana Bakur, bakur — roava roava û nîro roavayî re fîriyane û érisî hêjagehan kirine.

LONDRE — Li gora nûcîyenî ko ji Sviçreyê têni, Sérfermandariya elemani dike qîwetîne û nûnîne Belgîna.

NÜ DELHÎ — Bombeavêjén britanî bendera Sowelê, ya ko destê japo nan de ye, xira kirine.

BERN — Welatperwêren frensiz zehf trênen elemana ên eskerber hewa kirine an ji rê derêxistîne û pêzererine dijwar gîhandin e wan.

JENEV — Elemanâ 1.2.0 peyayên frensiz ên hêjagirtine û şiyandi ne Germanistanê; hal û hewalê wan welatperwêren çilo ye, ne nas e.

LONDRE — Hêsfîrin talyani xwe ji bona xebat û arikariyê, qedî mandine hikûmeta Britanya Mezin.

DER ENIYA BIRMANYAYÊ

NÜ — DELHÎ — Di Hindistanê de, li Kohîmâyê, érisen Hevalbendan pêş ve dikeve, her qend ji, hin taxeyen vi şaristani, hêj di destê japonâ de ne.

LONDRE — Cara dawin 1.500 belafirê emerikanî 1.600 ton bombe avetîne hêjagehén Berlinê.

CEZAYIR — Ev sê roj in, pey hev û du, refen Hevalbendan hêjagehén payetextê Romania'yê, Bükreş, dane ber bomban.

LONDRE — Leskeren Yugoslavî Klادano standîye, Zehf çek û posat û zad û zexire ketine destê yekîneyen yugoslavi,

WEŞINGTON — Salo ko bê karxane û destgehén emerikanî ji bona 60 milyar dolaran, çek û posatên seri çekin.

tan e ; û ji hemî zarawê kurdi bijartina yek zimanekî resmi ye. Serekcîvin an xwendekar, xelaskarê mîletê Kurd, tête niqandîn.

Li hember neyarê Kurdistan, yek deng û yek destekî ristemi em dirêj tola welat dîkin ; cewa kîrine.

Di roja aştiyê de, di wê komela heqbelavkirinê de, divê em ji xwediyê peyiv û dozêkî bin.

Liser kursiyê heqşinasi bersîfa neyarê xwe bidin û bi dilovaniya Hevalbendan, li xweser bijin ; ji bo vê ramanê, ji niho ve, em tev hîvî û guhdarê emrê mezinên xwe sekinine.

6 : Dîn û Mezheb :

Rûniştmanen Kurdistanê bi çar ayfan lêkve dibe, her çar tîvel ev in : Sinnî, elewî, ezedî, file.

Vana her yek, bi dinê xwe veaza ne. Tu kes ne derûdê-keffîlê-din û mezhebî hesekî ye ; lê Kurdistan erdê bayêt me û landika me her siyan e. Yezidî, elewî û sinnîyan e.

Em sê bira ne, yek xwîn û yek ten û yeknav in, û yek mîlet in. Serxwebûn û serbestî bi navê Kurdistanê, ne bi navê din û mezheb û olê ye ; lê navdariya rûspîti û dirokî li gora fedakari û xebatê tê nas kirin.

Hin, nav welatiyê me, aşori-kildanî, érmen, suryani, à cuhi ne, ew ji hevalê me, à hêvidarî jîneke dilovankarî ne ; heke wan xwe, bi me ve gîredin, em wan heval ê ciranen xwe dijmerin, çewan bav û kalen me bi hev re bihortine, emê hêj bêtir û çétir, bi hev û dil geş bin ; divê ew hêviya qencye ji me bikin, ne ko bi gotinê xerezkaran bêne xapandin.

Lewre, di rojên pêşber de ew ni karîn terka Kurdistanê bîkin xirabî dişwariyê tîne ; qencîştiyî pêk tîne

É ko zane dizane ; é ko nizane, tim xizan e; bela serî tim ziman e, li ber derdan bê eman e, roja ko tê bê guman e.

Cizir : H. Hisyar

NÉCIRA BERAZAN

Em, di réyén bi devi t bi kolem
re di çün.. Di gelek newalén kür, di
pir zinarén bilind, di hevraz u hev
xwarén dûr t diréj re derbas di
bûn.. Ex t du hevalén xwe bûn;
Sehén me, bi me re.. tifingé me, li
milé me.. rexit me, li pista me bûn;
Desté me, bi lepik, lingén me, bi
goréa risins u pélavén xurt naxum;:
bedena me, bi çekén teküz giréda-
yé bûn. Zivistan u çele bûn.. em di
çün ciyayé Mancéle, nécira berazan.

Ev, ne cara pésin bûn.. Gelek
caré din em bûn réwyen ve ri-
yé. Nécira berazan ji me re bûn
meraq u sergezestek. Me ji vê ser-
gezest heweseke derüm di stend.

Bi ro, em di meşyan.. bi şev ji
di şikeftan de, di man. Pişti sê rojan
me, néziki li armanca xwe kiri bûn.
berbe évaré bûn, dunya pir sar bûn,
em gelek westiya bûn. Lé em, né-
ziki şikefta « Gové » bûn bûn. Gava
em bi gihiştina şikefté, me yé ji xwe
re agirek dada, xwe germ u rehet
bi kira.

Em gihiştin ber şikefté.. lê
muzabin şikeft, ji bextî me re, hil-
wewiya bûn. Di wi cihi de tu şikefté
din tu ne bûn. Em nikari bûn bi şun-
da ji veger im; Di şev-regéde, di
wan relén bi kevir-kûc, bi rève
çün, ne inuskin bûn. Çar ne çar,
me xwe da ber tateké. Ci pi teng
bûn, téra hewina me t sehne me ne
di kir. Bi dişwarfı me xwe bi çih kir
t me agirek dada. Pişti şivé, baye-
ki reş dest pékir, peşké barané ha-
tin. Herke cù, ba, bêtir.. baran, zé-
detir bûn. Agiré me vedi mirf, cané
me şil di bûn. Em ji serma di qesi-
lin. Sehén me ji di ricifin, teriyen
xwe di kir in nav lingén xwe, beré
xwe bi jor ve di kir in u kür kür di
züriyan. Xuya bu ku inzara encam-
mekte xerab di dan me... Herke cù
şev, reş u tarı, ba u baran bêtir di
bûn. Tené gava birûskan ve di dan,
me kanf bûn ber xwe bidî ta. Em di
tirsyan ko tebayén kovî bi ser me
de bi girin u me şerpeze bi kin.

Nivé şev ba kêm bûn.. baran
sekim.. ewrin reş, perçe-perçe
belav di bûn.. li ci ciyan histerkan
xuya di kir in.. xwin u taqet li me
ve di geriya.

Lê qederek derbas ne bûn bûn,
sûna èwrén reş, ewrin spi u bilind
çé bûn.. bê guman ewré berfë bûn.

Bi desté sibehé re berf lepe -
lepe hate xwar.. dunya ronl di bûn
me kani bûn ber xwe bi ditta. Me
xwest em bêlan (merhele) ekê bi
şûnda veger in u beri flaketeke em
xwe bi gihişin şikefteké. Em, li ra-
bûn bûn, keriye beraz li me der
bûn.. ew berazén ku, ber qulik
qulik ji ber me di reviyan, ve car
har bûn u xwe diréj me di kir in.
Me her sê hevalan peşten xwe dan
hev u me beré tifingé xwe, bi wan
ve kir in. Sehén me ji, ji me re di
bûn siper, mîna pilingen d'ajotin
ser wan. Cengek mezin û no di nav
me de çé bûn. Berikén me di qed-
yan, lê hejmaré berazan — çiqas di
hatin kuş in ji— bêtir di bûn.. ke-
ri, kerf di hatin gazi t hewara

Berf, pâda di bariya.. bager u
pukéec çé bûn bûn. Niva ne ten-
beraz, ji her çesidi kovfyon deren-
ge xuya di kir in. Wan ji bi çavép

birç diréj me t sehén me di kir in..
Edi, berikén me qedian.. Ve-
car, me sungi bi ser tifingé xwe
ve kir in.. qedereki me bi dest
lepé ji, li ber xwe da.. paşé tab u
taqet di me ne ma; em her yek li
cihê xwe ket in..

Beré her sê küçükén me, pagé
her dû hevalé min hat in kuş in.
Koviyán, cendekek wan bi erdè re
kaş di kir in u di bir in...

Ez, keti bûn kortaleké.. berf, li
ser min tije bû bû.. ji ber çavén
koviyán wenda bû bûm. Herke di
cù berf, li ser min bêtir baré min
giran tir di bûn. Min nikari bû xwe
tev bi livanda. Lé vê car min ne sar
bû.. mîna di nav kurkekide bim,
cané min germ di bûn.

Bina min dicikıya.. di nav kefe-
nekli spî u tefib de, hedi - hedi, di
mir im. Hévi cù ara xelasé ne ma bûn.

Gava meriv li ber candayiné-
be, hemfi serbatîyen meriv bi care-
ké têr bîra meriv u mîna şirîten
sinemayé, li ber çavén meriv der-
bas.. di bin; Di wî half de gelek tişt
di hatin bîra min.. masfir ev dengé
ahenkdar — ku berf bîst, si salı,
gava ez zarok bûm — min di bihist:

« Ellahi heq!.. mewlyf heq!..
rizayi heq!.. »

Ev dengé derwêşkî cil - kesk
bûn. Her sal, du, sê caran, u her ca
ré ji nişkave xuya di kir.

Bejn — diréj, esmer, ri-sor
bûn.. Cibî wî kesk, kum u xavik —
kesk bûn.. Tizbiyek kesk u heb - gir
di hustiyé wî, keşkulek ji gutzé
Hindé li milé wî, çilakeki diréj u
ser-hesin di desté wî de bûn. Kuçe,
kuçe di geriya u bi dengé xwe yî
ahenkdar bang dikir:

« Ellahi heq!.. mewlyf heq!..
rizayi heq!.. » Her kesf jé re, zarokeni
xwe di bir in.. wî ji desté xwe yî
piroz di ser seré wan re di bir u
dan... »

Mala her kesf, mala wî bûn; li
her ci karf bû bi xwara u ve xwa-
ra u raketa.. Pirika min bi xwe pir
xatiré wî di zanf bûn; pere u xwa-
rin ji wî dirix ne di kir.. Wi ji desté
xwe, li ser seré min di ger, u
bi dizî tistik di xwend u pif di kir
dora min... Gelekan ji wî re di got
in: — « Xocé Xizir e.. ji nişkave
wenda u ji nişkave xuya di be.. di
rojek de, kane diné giş bi gere... »

o o o

Di bin tebeqeyen berf de, hil-
ma min di cikiya, xwédaneké germ,
ji laşé min bi der di ket. Hingi, ser-
encamé wisan di hatin bîra min, u
çav - endazî (menzere) yén wele
di hat in ber çavé min.

Ez, di nav mûliketki dîndar de
xwend u mezin bûn bûm; baweriye
min hebû, ku ew derwêş cil - kesk,
ew Xocé Xizir, nuha bê fîndada
min, u min ji miriné xelas bike.
Ew derwêş xwend keramet u xwe
di mücîfî-ku di rojek de kanf bûn
li diné giş bi gere - kanf bûn di wê
gavé de, bê hewara mirîde xwe yî
kevn ji..

Ez, di vê héviye de bûm, ji
hatif dengel hate min, di got:
« Metirse, ez tém... »

Min li jor nérî tebeqeyen berf
ji dîstina çavé min re manl ne di
bûn; min di ji jor ve, murxekî gir
gus, gus, di fire u ber be min da di
keve.. paşé li ber min venligi.

Min bi héviya Xocé Xizir dile dar, min li diné di nérî... »

MIREKA CIHANE

MIREKA CIHANE MIREKA WENEYEN SER U ASITIYEN

CENG & BIHINCEG



Lergelheke Spîti i liehfeza



Şefqeyen Jin u Doten Ewripayé

MOSKU— Serfermandariya Sovyeti şev cüyi denezana jérin belav kiriyé: Les-keren eniy ukranayé a çaran pişti çar rojén seri çepér u aségehen dijmîn ê beton u hesinşidayı zır u zeber kirine u Sébastopol standine; bender u qerargeha Behra Reş a qaimtir u héjatir. Bi wî awayî axa Qirimé ji dijmîna bi timamî, hatiye paşîj kirin. Di eniyen din de, sayesteyi gotinê rewîs guhêrek çenebiye. Li 8-ê gulânî, 48 balafîrin dijmîn hatine avetiñ erdê: der şerîn hewayi u bi agirê to-pen me ên ber-balafir.

LONDRE— Eleman didin,zanın ko ordiya Sor di Dniestra jérin de, dest bi
erîşen mezin kirine; hawîren Moskowî derev bi ali vê nûçeyé ve didin.

Di hêla Dniestre de, elemana bi xwe bi qiwetine mezin ber-erîş kiri bûn
u her weki erîşen wan hatine paş ve birin, bi belavkirina wan nûçeyan, dîkin
bêçareyiha xwe veşerin.

LONDRE— Di nav 24 saetin dawin de reflîne britani u emerikanî ên mezin
dirîjî axa Germanstanê kirine u lêxistine; 1.000 bombeavêj u 1.000 nêçirvan têkilî
van erîşan bûn.

xwe vejan di bû.. min di got qey ew
derwêş min f cil-kesk u keşkûbi
dest e. Muxabin, murxekî per-diréj,
sing-bi pûrt u ser-girover (mîna
Stalîn) ser mezin bûn.

Hingi, héviye min şkest; bê gû
man ev murxekî berate (cenaze)
yan bûn.. Qey berf ez bi mir im, bîna
min hilaniye u hatiye cendekek min
bi xwe.. Ez pir di tirsyan.. le
murxé gewre u pir heybet, ne ji
wan murxé beratan bû; penç xwe
yi polayî bî dilované li ser ruyé
min gerand, u ez avétim ser basi-
ké xwe yi hesin, u ber be ezmanan
firand im.. Edi tîrsâ miriné ne ma
bu.. Bi dilekti azad u bi çavéki jîn-

Gava min çavé xwe ve kir, min
xwe, li ser basiké fu murxan ne
dit.. Ez li mala xwe, di nav nîvînê
xwe de bûm. Tuxtorê cil-sipî seré
min bilind di kir u bi kefçikî derman
bera qirika min di da.. li rast u
cep du, sê merivé min, bi tirs li
min di nérîn u hésir ji çavé wan
di herikin.. Tuxtor di keniya u di
got:

— Edi metirs in.. Nêxweş me,
kefen çirand... »

Mesê min hedi-hedi dihat seré
min.. ez, ji bist rojan de ne xweş
bûm.. nêxweşya min tifoseke giran
u bê eman bû...

Şam; 23-4-944 Qedî Çan

LE JOUR NOUVEAU

Direction: Beyrouth Wakf Tabet
Place des Canons Tél.: 74-04 et 84-41

Directeur - Propriétaire: EMIR DR. KAMURAN AALI BEDIR KHAN

Le Numéro 15 P.L.S. Abonnement
Syrie-Liban 15 L.L.S. Etranger 2 L. Stgs.

KURDISTAN

Après la dernière guerre, les Alliés, s'inspirant des principes wilsoniens, avaient non seulement envisagé la création d'un Kurdistan autonome, mais ils en avaient incorporé le projet dans un Traité International, le Traité de Sèvres. Un coup de force a empêché que le peuple kurde ne bénéficie de l'application de ce traité. Les huit à neuf millions de Kurdes ont été partagés, avec leur territoire, entre plusieurs états. Dans ces états, ils constituent des minorités ne jouissant d'une certaine autonomie nationale que dans la mesure variable où une puissance européenne peut la leur garantir.

La division et l'asservissement du Kurdistan ne pourront être maintenus au sein du monde nouveau de l'après-guerre. La question devra être reprise, dans l'esprit qui animait les rédacteurs du Traité de Sèvres. La seule solution compatible avec les principes pour lesquels luttent aujourd'hui les Alliés, c'est la création d'un Kurdistan autonome, embrassant tous les territoires habités par les Kurdes.

Il se trouvera peu de cas où l'application littérale de la Charte de l'Atlantique offrira moins de difficultés de principe : les Kurdes habitent un territoire compact, riche en ressources naturelles. Les minorités ethniques y sont très peu nombreuses.

Mais cette solution radicale de la question kurde peut heurter certaines ambitions, désireuses de maintenir le statut quo : des objections pourront donc être soulevées. Nous allons tâcher, pour la défense de notre thèse, d'approfondir certains aspects de la question.

1. — Les Alliés ont pris les armes pour sauver la civilisation menacée par un régime qui pratique systématiquement la cruauté et l'injustice, dans ses formes les plus brutales, au mépris des droits les plus élémentaires des peuples. En Turquie, en Iran, les Kurdes ont subi un régime tyranique qui ne peut être défini autrement et dont la suppression s'impose au même titre. Cet état de choses constitue lui aussi une offense au monde civilisé.

2. — Le partage d'un peuple de huit à neuf millions d'âmes entre trois ou quatre états crée, dans chacun de ces états, une minorité dont l'existence implique des frictions continues entre cette minorité et la population majoritaire. Cette situation met en danger constant la sécurité intérieure et extérieure de ces états.

Les zones frontalières de ces

états, là où ils se touchent, sont habitées par des Kurdes qui, quoique de nationalités différentes, sont animés les uns envers les autres d'un profond sentiment de solidarité. Chaque état ne peut donc avoir le contrôle de sa zone frontalière qu'à condition d'avoir également le contrôle de celles de ses voisins. Il en résulte des ingérences qui sont la cause de complications diplomatiques et qui risquent toujours de devenir le prétexte d'interventions armées. En outre, les mouvements de population entre les différents territoires kurdes ne peuvent être empêchés qu'à condition que, dans les différents états, les Kurdes soient soumis à un régime également oppressif.

Le maintien de ce régime d'oppression devient la condition même des bonnes relations diplomatiques entre les pays à minorités kurdes ; l'ouverture d'une école kurde dans un des états voisins sera considérée par les Turcs comme une atteinte à la sécurité intérieure, de leur pays.

Le Kurde, toléré par les autorités, bon gré mal gré, dans la partie kurde du territoire, n'est plus qu'un étranger dès qu'il en sort. Il ne peut donc considérer l'état dont il est le ressortissant, comme sa patrie et il est, au contraire, rempli d'un sentiment d'amertume à l'égard de l'autorité centrale du pays ; il tente, par des révoltes, de secouer le joug qui l'opresse.

3. — Pour chacun des états qui se sont partagés le Kurdistan le territoire kurde qui est compris dans ses frontières est comme une colonie qu'on craint de se voir arracher. Cette crainte est d'ailleurs légitime dans un siècle où, pour la deuxième fois, de puissantes alliances se sont constituées pour la libération des peuples opprimés. Ces états traitent donc les fractions du Kurdistan en autant de colonies d'exploitation desquelles on tâche de tirer le maximum d'impôts et de soldats, sans y entreprendre aucune œuvre constructive. L'autorité n'y appuie pas l'initiative privée ; au contraire, elle la décourage. On tend à détruire l'industrie locale au profit du développement de l'industrie située dans la partie du territoire habitée par la population majoritaire.

4. — Quand un des états comportant une minorité kurde se croit assez fort pour envisager l'incorporation définitive de son territoire kurde, il tâche d'appliquer l'assimilation forcée.

Cette politique n'a pour résultat

que d'exaspérer le particularisme national des Kurdes. Les Kurdes qui, autrefois zoroastriens comme les anciens Perses, n'ont pu être assimilés par eux, aujourd'hui musulmans, ne peuvent être assimilés ni par les Turcs, ni par les Arabes, ni par les Persans. Ce peuple qui, à travers 4000 ans d'histoire, a maintenu son individualité nationale sous toutes les dominations, ce bastion indo-européen qui, au cœur de l'Asie Mineure, a résisté à toutes les invasions, est inassimilable. Des différences de race et de langue comme celles qui séparent les Kurdes des Turcs et des Arabes, ne sont pas seules en cause. La vitalité de leur individualisme national les séparent tout autant des Persans qui, quoique de race fortement mêlée d'apports tatars et arabes ont pourtant avec eux des affinités linguistiques et raciales.

La tentative d'assimilation la plus systématique et la plus brutale est celle qui a été faite par les Turcs depuis le début du siècle. Elle a lamentablement échoué. Les Turcs ont voulu favoriser l'immigration de familles turques en territoire kurde. Loin de contribuer à la turquisation des Kurdes, ces familles turques se sont assimilées à leur entourage, des rapports secrets du Gouvernement Turc en font foi. Les Turcs ont amorcé la déportation en masse de Kurdes vers l'Anatolie ; des révoltes ont éclaté, si terribles que cette méthode a du être abandonnée.

Les Turcs ont interdit l'usage de la langue kurde, le port du costume kurde ; ils ont prohibé les chansons kurdes. Les jeunes Kurdes ont été forcés de fréquenter des écoles turques. Le mot « Kurdistan » a été rayé du vocabulaire géographique turc. Peine perdue : les Kurdes parlent toujours leur langue ; les inoffensives chansons populaires sont devenues des chants subversifs ; les jeunes gens quittent l'école turque plus Kurdes qu'ils ne l'étaient avant d'y entrer. L'enseignement forcé en turque donne lieu à des bagarres ; engrangé nombre, les écoles sont fermées.

5. — On a peut-être songé, comme offrant une solution à la question kurde — puisque l'assimilation forcée ne réussit pas — et pour sauver l'intégrité territoriale des états qui se sont partagés le Kurdistan, au massacre. En effet, on ne peut oublier que les Arméniens de Turquie ont été les victimes de l'application de cette méthode. Mais, en premier lieu, aucun des états en question n'est assez fort pour massacrer impunément les Kurdes ; pour le faire, il leur faudrait l'appui d'une puissance occidentale. En deuxième lieu, l'extermination des Kurdes

transformerait le cœur du Moyen-Orient en un désert ; et on ne voit pas qui remplacerait ces robustes paysans.

6. — Est-il possible de garantir les droits nationaux kurdes sans qu'on transforme, en ce qui concerne le Kurdistan, la configuration politique du Moyen-Orient ?

L'histoire récente prouve que, pour assurer la protection de ces droits, il faudrait installer, dans chacun des états qui se sont partagés le Kurdistan, un contrôle des puissances occidentales si étroit que l'indépendance de ces états deviendrait absolument illusoire.

7. — Songerait-on pour simplifier le problème, à incorporer tout le Kurdistan à un des états du Moyen-Orient ?

Ce serait vouloir remonter le courant de l'histoire : le plus fort de ces états, le seul qui se soit montré capable de réunir de nombreux peuples sous sa domination, la Turquie, n'a pas pu les empêcher de se détacher d'elle. Remarquons que l'adjonction de la totalité des Kurdes à un des états du Moyen-Orient aurait pour résultat de le transformer en un pays à majorité kurde.

8. — A ceux qui attendent la stabilité politique et économique du Moyen-Orient de la création d'un bloc d'états, nous dirons que la formation d'un état kurde homogène ne constituera pas un obstacle à la réalisation d'un tel plan.

Un bloc d'états ne peut tirer sa stabilité que de celle de ses éléments constitutifs. Cette stabilité ne pourra être atteinte que si on applique la solution de la question kurde telle que nous l'envisageons.

9. — Pour terminer, répondons à ceux qui objecteraient que les Kurdes, dans l'histoire, n'ont jamais formé d'état unifié et indépendant.

Citons d'abord Saladin et les Ayoubites qui, avec leurs Kurdes, ont créé un état puissant et glorieux qui a permis au monde musulman de résister aux attaques des Croisés.

Mais rappelons surtout qu'à toutes les périodes de l'histoire, et jusque tout récemment des principautés kurdes ont maintenu leur indépendance. Ces principautés dans les montagnes du Kurdistan, dont la nature même invitait le morcellement en groupements séparés, ont conservé à travers les siècles la Nation Kurde. Dans le monde d'aujourd'hui, montagnes et vallées ne constituent plus les obstacles qu'elles représentaient autrefois.

Pour le peuple kurde, le système des îlots de résistance était une force ; mais, faisant face aux nécessités du monde moderne, ce peuple veut se constituer en un état unifié.



Bajar û Bendera Emerikayê i Mezintir Nû-York: Piştî Londrê Saristané Dinyayé ê Térzelk

QEMERZEMAN

- 3 -

Pir aciz bû, keçik hêj ne hatiye. Çavê wi hişk bû li riya wê. Keçikê heta wextê razanê xwendinek wê heye a sîhre dixwîne, heç şiyar radize; kesek şiyar ne ma.

Bi ber wi diçe û tê şiyar na be. Keçikê kumek şekir xiste bêrîka wi û jê re got: tu zaro yi, here nav zaroka, tu ne gihaye jinê.

Keçik çû oda xwe, ev xwendina xwe i sîhre xwend, heç razayî bû şiyar bû. Qemerzman şiyar bû û di fikra wi de go: ranezaye. Di nav bexçê de ma heyâ sibehê, ji xwe re got, pîrê derew li mim kiriye, kani keçik ne hat cem min.

Hat mala pîrê, go: ci derew bû, te li min kir, ez şevê di heyâ niha, nav wi bexçeyî de mame, mi ken ne diye. Pîrê go: weh.. ev ci ye, henekê xwe bi me dike, ezê rabim herim cem û jê re bêjim; lê, cima te wilô li me kir. Pîrê çû cem û jê re got: wey qîza min, ta'ba min li te heoram be.

Te ne go hinik lawîkê xelkê, di nav bexçê bavê te de bikujin, ci heqê te li me heyel Pirsck rast ji me re bêje, ya erê ya na... Keçikê jê re got: cima tu dixe-yidî, min derew ne kiriye, nisanen

min pê re hene, bela işev cardî bê nav bexçê bavê min.

Pîrê hate mal û ji Qemerzman re got: go tu şevê şuyî razayî bû, ka nîganê wê bi te re hene, li bêrîka xwe binêre!

Li bêrîka xwe nêrî, şekir der xist; Sér jê re got: ya birayê min, ev şekir te ji ku anî? go: ez nizanîm

Go: tu nizanî, ewê şekir xistiye bêrîka te û gotiye tu ne gihaye jinê her ji xwe re nav zaroka bileyize.

Sér ji pîrê re got: here ji mi re carciyê goşline bîne, dilê me dibije got.

Pîrê çû, şost anî û Sér ji birayê xwe i Qemerzman re got: were, were, li destê min bigire, ezê hûr bikim.

Qemerzman şost li destê wi girt û Sér hûr dike, ewîna diştexilîne, kér li tiliya wi xist û tije xwî kirin, û girêdan û go: de here işev nav bexçê, ji bona ko tu ranezê...

Qemerzman çû nav bexçê, ma heta wextê razanê, keçikê sihra xwe xwend, xelk hemî razan, Qemerzman diki ko raze, tiliya wîna dêse, nikare razê.

Keçikê daket nav bexçê, Qemerzman lê nerf, ko nav bexçê şewq da; ma ecîbmâyî, pîrî wê ve çû, destê hev du girtin û pev şâ bûn, hişê her diwa, ji serê wan çû.

Keçikê jê re got: Ya Qemerzman, mi çiçeyis

xelk ditin, dilê min ne bijiya kesi, ji te pê ve. Emê çawan bikin, ko ez û tu hev du bibin.

Bavê min, ne mihtacê pera ye: ko tu bîdiyê qelenê min û bi bîhîze min nade te; şeveke din tu û bîra-yê xwe, xwe hazir bikin, li derê bajêr bisekinin, ezê bêm cem we û einê ji wê derê herin.

Qemerzman bat cem brayê xwe i Sér, jê re got îşê me qediyaye şevel di emê herin. Adînê rojê, ci

ji wana re lazim bû, kirin ji çar-

şiyê û pereyê xwe i zêde, ji pîrê re

vala kirin, xatir jê xwestin û gelik

û dîlxweş bûn û çûn; derê bajêr

sekînin, saetekê man, heyâni ko

dînya bû şev, keçik hat cem wan.

Pev re meşyan, şev û rokê meşyan. Bavê wêna adeta wi hebû hero sibehê diçû cem qîza xwe, dîlxweşî didayê.

Wê rojê çû oda keçka xwe, nedît. Sîhirbend li bajare wi zehf hene; hemî civandin û ji wan re

got: lazim honê bi sihra xwe qîza min, û yê ko bîriye vegerfinin.

Sîhirbend wîna sihra xwe dîlxweşin, sihra keçikê bi a wana kare; ni karin tişteki tê bike.

Hikmê bîst rojan meşyan, piştî ko bîst roja meşyan; keçikê ji was re got: em bi selametîye ketin, ji hikmî sihrê, em xelas bûne, hon rûdînîn an dimeşin, bikêfa xwe ne.

Qemerzman got: Em westiyan e, emê bişik bîh

na xwe vekin. Ji xwe re çadirek vegirtin û Sér ji, ji xwe re yek ve-girt.

Her kesi ji wan, li bin çadira xwe ye. Qederê saetekê Sér guhdarî dîke, dînya şev e, carekî bîhîzi qîrin, ji bin çadira birayê wîna hat. Rabû ser xwe û çû çadira bi rayê xwe nerf, ko birayê wî raza ye û keçik ne xuya ye: jê re go: ka keçik?

Go: ez ni zanim.

Carekî nerî, qîrina keçikê dûr tê, Sér bi dû dengê wê de megiya û çû; çiqas qîrin tê, ew dimeşe bi

dû de, heyâni ko giha şikeftekê. Li ber deriyê şkeftê, li hinduro

nerî ko hûtele e, û keçik li ba wi ye, keçik dîgrî.

Keçikê li ber deriyê şkeftê nerî ko Sér li wê ye; go: li mi hal e, ma li te çi hewal e, ko ev hût şiyar bibe, wê te bike ax, were hindur vê şkeftê xwe vegêr, heyâni ko hût şiyar bibe, ezê reca te jê bikim. Sér di hinduro de xwe veşart, he yanşî ko hût şiyar bû, got: ya qîza delal, bîhna insanan li vir tê...

Keçikê lê vegerand û got: insan ki hene li cem min, belki rojekê ehlîki min, an birayê min, bê cem min, ma tu bîxeyidi?

Hüt jê re got: brayê te ko bê cem te, ez na xeyidim; weki din, ki bê cem te efiwa wan tunne. Keçikê jê re got: birayê min va hatiye! Ban kîriyê, Sér hat cem wan, rûnişt.

(ne qediyaye)